Renasî bo kirrêgiran ji ku di bikar anîna wize û avê biparêzin

Kirrêgir jî dikarin ji qazancên kiryarrên ekonomî di bikaranîna av û wêzeyê da behremend bin, Nêzî ji sêyan yek ji xelkê Awistralîyaê di malê kirrê da rûdinên û tevî hebûna gelek astengîya di guhertina avahîyê kirrê, heya bê berçaw girtina bijarên wek sefheyê rojê û menbeyê ava baranê, gelek rê bo kêm kirina xercan û parastina jîngehê hene. Di rastî da, hinek ji kiryarrên balkeş ku hûn dikarin ji bo kêm kirina xercên wize û avê pêk bînin, guhertinên biçûk di edetê xwe yê rojane da ye ku ji were bê xerce.

Tevî ku hûn demek kurt be Kirrêgirê bin yan demek dirêj, hûn dikarin bi pêk anîna honek kiryarrên cûda yê sade û erzan xercê wêze û ava xwe kêm biken û bê kêm kirina rewşa jîyana xwe di salê da sedan dolaran ji xercê xwe kêm biken.

Ramanên kêm kirina xercên wizeê

Bandora wizeê (anku kargerîya bikaranîna wizeê) bi wateya kêmkirina bikaranîna wizeê ye bê ku ji asata kargerîya bikaranîna, rehetî û asayîyê kêm bibe. Pê bikaranîna xalên pratîk hûn dikarin rêjeya bikaranîna û xerçê xwe yê wizeê kêm biken.

- ✓ **Ev amûran bikar bînin ku kargêrîya wizeya wan zêde be.** Ji sedî 30 ji wizeya ku di mala da tê bikaranîn ji alîyê amûrên malê tê bikaranîn. Liber vê, çêşîta amûrên malê û rewşa bikar anîna wan bandorek zêde liser rêjeya bikaranîn û xercê wizeya malê heye. Eger hûn dixwazin amûrek nû ji malê re bikirrin, modelekê bibijêrin ku kargerîya wizeya wê zêde be. Bi nêrîna liser Etîketa Asta Wizeê dikarin asta kargerîya wizeê ya amûrê bizanin. Bi qasî ku hejmara stêra zêde be, rêjeya bikaranîna wizeê û xerca jî kêm dibe.
- ✓ **Rêjeya germahîya hewa konterol biken.** Nêzî ji sedî 40 ji pişka wizeya ku di mala da tê bikar anîn ji germahî û sermayê re diçe. Di zivistanê da, termostata germahîye li ser 18 heta 20 derceyê sêlsiusê danên. Di havînê da, termostata sermayê li ser 25 heta 27 derceyê sêlsiusê danên. Heya yek derce zêde (yan kêm) kirina asata termostatê ji sedî 5 heya10 ji wizeya pêwist bo germahî yan sermayê kêm dike. Paş vekirina amûrên hewasaz yan sobeya, derê odeyê ku nayên bikaranîn girêbiden.

Arabic
Bosnian
Chinese Simplified
Chinese Traditional
Croatian
Dari
Dinka
English
Farsi
Filipino
Greek
Hindi
Indonesian
Italian
Karen
Khmer
Kirundi
Korean
Kurmanji
Macedonian
Malay
Punjabi
Russian
Serbian
Shona
Sinhala
Somali
Spanish
Sudanese Arabic
Swahili
Thai
Turkish
Vietnamese

- ✓ **Kun û derza bi derzgirê bigrin.** pê zevt kirina mala xwe û bergirî ji çûna germahî û sermaya malê di kunan û derza da hûn dikarin ji sedî heya 25 ji xercên wizeên malê kêm biken. Ji bo bergêrî kirin ji derketina hewa di bin deran da pateyên pir ji xîz (wek 'marek' dirêj) bikar bînin. Ji bo parastina penceran, rayêxê dar, textêyn divar, ronahîgir û qirnîsan bergêrê hewa bikar bînin. Gel xwedîyê mala xwe bipeyivîn pêş ku hûn bergêran biguncînin.
- ✓ **Kargêrîya pencera zêde biken.** Pê bikar anîna perde û ronahîgirê hêja hûn dikarin hewayê ravestayî cem pencerê kom bikin û izna xisar bûnê nedin. Di zivistanê da bo bikaranîna rojê dikarin di rojve perda vebikin û pêş tarî bûna hewa perda bikişînin. Herwisa, girtina perdeyan di roja herî germ ya zivistanê, fikrek başe.
- ✓ **Zêdetir pankê bikar bîni heya hewasazê.** Xercê denjimêrek bikaranîna pankeyê ban û sitona nêzî sentekê ye. Ev pankene li hember dezgahên hewasaz da gazê serayê kêmtir çê diken. Panke alîkarîya gerrandia hewa dikin û dikarin wan ji bo zêde kirina kargerîya sazîyê sermayê û herwisa gerandina hewayê germ û başkirina sta kargerîya germahîyê di havînê da bikar bînin.
- ✓ **Amûrên ku mesrefa wan kême bikar bînin.** Nêzî ji sedî 7 ji wizeya malê ji ronahî kirina malê re tê bikaranîn. Pê bikaranîna amûrên ronahîyê yê kêm mesref û bikaranîna hêja ji çira dikarin xercên ronahîyê nivî bikin. Guhertina lampeyên kevn gel lampeyên floresent yê biçûk (CFL) yan diodên ronahîker (LED), rêyek balkeş bo kêm kirian xercên wizeê ye. CFL nêzî ji sedî 20 ji wizeya lampeyê kevn bikar dinî û temenê lampeyê LED 4 heya 10 caran ji lampeyê kevn zêdetire.
- ✓ **Wizeên amadeyê şolê.** Gelek ji amûrên malê wek şarjên telefona, konsolên listikê, ocaqên mikrowavê û dezgahên steryoyê di dema bêşolîya xwe da ji wizeê bikar dinin. Ew amûrên amade bû şolê gengaze ji sedî 10 ji wizeya karebayê ku di mala we da tê bikar anînin bikar bînin. Bi weqetîna simên ew amûrane ji karebayê paş bikar anîna wan, dikarin hem heza ku hûn bikar dînin kêm bikin hemjî xercên xwe. Çirayê biçûk yê ku amadeyî şolê ne yan demjimêrê vekirî karebayê mesref dikin.
- ✓ **Dolap û firîz.** Germahîya herî baş ji dolapan re, 3 heya 5 derceyê sêlsiusê ye. Û di firîza dadi navbera 15 heya 18 derceyê sêlsiusê bin sifrêda ne Kêmbûna her derceyekê dibe sedema zêdebûna ji sedî 5 ji mesrefa wizeê. Paqij kirina firîzê û durdanana dolapê ji divar bi qasî 5 heya 8 sanîmetra dibe sedema zêdebûna kargerîya wizeya dolap û firîza. Eger ji bo rojê hebûnb mêvana dolapek duyem kirîye tenê di demê pêwist da vê bikar bînin.
- ✓ **Şûştin û hişik kirina cilan.** Di dema bikaranîna makîneya şûştina cila, pê bikar anîna ava sar û dora herî kêm, hember kirina pileya avê gel rêjeya bar û bikar neanîna berdewam ji makîneya cilan, hûn dikarin di mesrefa wizeê û avê da xerçê xwe kêm biken. Bo hişik kirina cilan bi şûna bikar anîna hişkera karebayî ji benda cilan ku bêpereyê, bi kar bînin.

Xalên bikar anîna avê

Pê bikar anîna avê bi hêjayî, hûn dikarin ev madeya biqîmet biparêzin û xercên dabîn kirina avê kêm biken. Gelek rê hene bo ku hûn di mal û baxê xwe da avê bi şarezayî bikar bînin û ev madeya biqîmet biparêzin.

- ✓ **Amûr û amrazên ku mesrefa wan kême bikar bînin.** Di dema kirrîna amûr û emrazê nû modelên ku mesrefa wan kême bibijêrin. Çav li pile Etîket û Pivanên Bikar Anîna Avê (WELS) biken.
- ✓ **Bikar anîna şireya avê bi başî.** Dilob kirina dilopên avê ji şîrê bi qasî dilopek di xûlekekê da, dibe sedema xisar bûna 12,000 lîtreyê avê di salê da. Bi çêkirina şîrên ku dilob diken, ber ji xisar bûna avê bigrin. Pê bikar anîna hewaderê (aerator) dikarin mesrefa ava xwe kêm biken. Hewader gerreka avê

kêm dike û dibe vê di nav yan liser şirê da bikar bîni. Bo danana hewaderê divê hûn ji xwedî malê xwe iznê werbigrin.

- ✓ **Bikar anîna serdoşa kêm mesref.** Eger hûn serdoşê kevn bikar dînin, ji xwedî malê xwe bixwazin ku vê gel modelek nû veguherîne ji ber ku mesrefa ava serdoşa nû nêzî ji sêyan yek ji serdoşa kevn e û pê bikaranîna vê dikarin xercê avê her salê nêzî 200 $ kêm bike.
- ✓ **Filaş tanka tavalêtê.** Di tavalêtê ku fileşa ducûre bikar dînin, eger gengaz be, niv-fileşê bikar bînin. Eger xwedî malê we dixwaze tivalêta tek-fileş veguhere, ji wî re pêşnîyar bikenku modela fileşa ducûre ya kêm mesref bibijêre, jiber ku ev modele ji bo her kesekî bi qasî 51 litreyan mesrefa avê di rojê da kêm dike. Eger ev derfete pêş nehat dikarin bi kirîna dezgaheke guherrîna pileya avê yan dayîna qabek pilastîk pir ji avê di menbê da, hecma vê kêm bike.
- ✓ **Rêjeya ava ku hûn ji bo baxdarîyê bikar dinin kêm biken.** Çîmenê şîn yê tradisyonal ji sedî 90 ji ava we ya baxdarîyê mesref diken. Eger hûn makîneya xwe ya çîmen lêdanê li ser rêjeya 4 santîmetra daynên, ev rêjeye tê kêm bibî. Bi çêkirina rewşên avdanîyê û bikaranîna berhrmên kêm mesref jî dikarin rêjeya ava pêwîst bo baxdarîyê kêm biken.

Çavkanîyê kirrêgir

Peyivîn gel xwediyê malê yan a firoşgeha mala

Çêkirin, sirvîs kirin yan parastin, pêkhatî ji hemwar kirinê berdewam, bi giştî hewceyî izn (û diravê) xwedi mala weye. Her herem û bajarekê zagonên taybet bi xwe hene di bara kirrêgiran da. Liber vê divê pêş ji pêk anîna guherrîna, nirxandinê pêwîst bêne kirin û iznê pêdiwî bên istandin.

Di dema kû hûn ji bo wergirtina izna guhertinên berdewam serdana xwedî mal yan firoşgeha mala diken divê ji çend xalê balkeş guhdarî biken wek:

- ✓ **Lê borîn û alîkarî.** Dewlet di mijarên sazkirina guhertinên berdewam da hindek lê borîn û alkaîrîya ji xwedîyê malan re dike. Ji bo dabîn kirina daxwaza xwe hûn dikarin jio bo xwedîyê mala xwe lêpirsîn biken û bo bidest xistina agahîyên pêwendîdar gel rewşa xwe ji pişka lê borîn û alîkarî re serdan biken.
- ✓ **Lê borîna bêşê.** Gelek ji çêkirinên malbatî û herwisa mijarên çêkirinê û parastinê dikevine bin buhaşikestinên bêşê da. Ji bo agadar bûn ji buhaşikestinên mala xwe û ragehandina nûçeyên xweş ji xwedîmalaê xwe re, dikarin serdana Rênasîya xwedîmalên malê kirrê di navenada bêşan ya Awistralîyayê bike.
- ✓ **Qazancên veberhênanê.** Xwedî mal bi xerc kirina dirav ji bo çêkirinên malê da ku dibe sedema bikaranîna ekonomî di bikaranîna wêze û avê da dikare qîmeta avahîyê xwe zêde bike. Vê ji bo bikirra û kirrêgirê siberojê xweşîktir bike.

Daxwaza xwe hetmen bi nivîskî pêşkêşî xwedîmal yan firoşgeha malan biken. Herwisa ji we re tê pêşnîyar kirin ku serpêhatîya hemû daxawazên xwe ji xwedîmal û herwisa girêdanên xwe gel wî yan firoşgeha malan ji bo pêkanîna guhertinan yan çêkirina rabigre.

Hûn dixwazin zêdetir bizanin û baştir mesref biken?

Komek berferh ji xalên piraktîk di mijarên kêm kirina xercên wize û avê û kêm kirina rêjeya sefera û çêkirina paşmayîya û herwisa hinek agahî liser alîkarîyên dewletê bi zimanê Inglisî di www.energy.gov.au da hatine pêşkêş kirin.

Zanyarîyên taybet bi kirrêgira û xwedîmala di hereman û bajaran da

Agahîya neberpirsyarîyê

Dewlet, rastîya dosya çavkanîya wergêrrê misoger nake û Ti nêrîn liser rastîya agahîyên ku di dosya serekî yan ev wergêrrê da hatîyê nîne. Dewlet liser ev wergêrrê û rastîya vê ti misogerîya nade. Dewlet û rayedar, karmend û berpirsê vê, li ser xisar, zirar û zîyanê (yekser yan neyekser)ku bi sedema bikar anîna yan bawerî bi ew wergêrrê ji wan re ketîyê, ti berpirsyaretî nîne, tevî ku ev bikar anîna yan bawerî li gor agahî yan pêşnîyarê ajansê jî bibe.

This translation was funded as part of the Australian Government Multicultural Access and Equity policy.